Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal de

Hejmar: 113
21'ê Hezîrana 2009
Buha: 150 Tûmen

agiri

Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

PDKÎ û KOMELE'yê di daxuyaniyeke hevbeş de, spasnameyek derheq baykutkirina hilbijartinan pêşkêşî xelkê Rojhilatê Kurdistanê kirin

Rûpela 2...

Zanyariyek nû û giring nîşan dide

EHMEDÎNEJAD DI TERORKIRINA Dr. QASIMLO DE DEST HEBÛYE



Nûnerê Partiya Keskan li Palemana Qtrîşê, Dr. Piter Piltz li bajarê Viyenê, di konferanseke çapemeniyê de bi beşdariya dehan nûçegihanên Qtrîşî û cîhanî zanyariyek nû derheq beşdariya Mehmûd Ehmedînejad, Serok Komarê rejîma Komara Îslamî a Îranê di terorkirina rêberê navdar yê gelê kurd û Sekreterê Giştî yê PDKÎ, Dr. Qasimlo û hevalên wî di 13.07.1989'an de li bajarê Viyenê eşkere kir.

Li gor gotina Dr. Piltz, "di rastbûna vê zanyariya nû a Polîsê Îtalya û Otrîşê de tu şik û gumanek tune ye". Ev zanyariya nû ji aliyê Polîsê dije mafya yê Îtalyayê ketiye destê Dr. Pîter Pîltz. Dr. Pîltz di daxuyaniya xwe de wiha got: Piştî girtina qaçaxçî û bazirganekî çekan ê Almanî yê bi navê **S** di sala 2006'an de li Îtalyayê û di encama lêpirsîna Polîsê Îtalyayê, wî bazirganê çekan îfade dabû ku wî çek û sîlahên terora Viyenê daye destê kesekî ku ew jî Mehmûd Ehmedînejad, Serok Komarê rejîma Îslamî a Îranê ye. Di pertokola lêkolîn û lêpirsînan de, **S** basa çawaniya nasîna kesekê bi navê Burhan dike ku li Viyanê têkilî pê re çê kiriye û xwestiye çekên sivik û giran li **S** bikire ku piştre ji wî re diyar dibe ku wan çekan ji bo musilmanên Bosniyayê bûye û Burhan di balyozxaneya Îranê de li Viyenê maye û diravê çekan jî ji balyozxaneya Îranê wergirtiye.

Dom di rûpela 2'an de...

Xelkê Kurdistanê Herî Kêm Di Hilbijartinên Serok Komariya Îranê De Beşdarî Kir

Xelkê Kurd di Rojhilatê Kurdistanê de, bi rêjeya herî kêm di dehemîn gerra hilbijartinên Serok Komariya rejîma Îslamî a Îranê beşdarî kir. Li gor agahiyên Navenda Nûçegihaniya Kurdistanê, xelkê Kurdistanê ji Makû heya Îlamê bi pirranî şanoya hilbijartinên serkomariya rejîma Îslamî baykut kir û rêjeya herî kêm a beşdarînekirina xelkê di asta Îranê de, li Kurdistanê bûye. Komara Îslamî ragihandiye ku di seranserê Îranê de ji sedê 85 a kesên ku mafê dengdanê hebûn(46 milyon), di vê şanogeriyê de beşdarî kirine. Rejîm dibêje navinca beşdariya xelkê Kurdistana Îranê di navbera 60 heta 70 ji sedê bûye, lê sindoqên vala û betal li gund û bajarên Kurdistanê berevajî vê îdeayê nîşan dan, heta 2 berbijarên rejîmê Mûsewî û Rizayî ew hejmar şaş zanîn. Ji ber mîlîtarîzekirina Kurdistanê, herî zêde kirêgirtî û hêzên leşkerî ên Komara Îslamî çûne ser sindoqên dengdanê li kurdistanê. Navendên dengdan bi Serok Komarê dehem ê rejîma Îslamî li Kurdistanê vala bûn û baykut gellek berçav bû.

Xebata kurd bi soz û qewlên derew... 3

Komara diz û derewînan 4

Jiyan û mirin 9



Spasnameya Hevbeş Derheq Baykutkirina Serkevtî Ya Şanoya Hilbijartinên Serok Komariya Îslamî Ya Îranê

Şanoya hilbijartinan bi dawî hat û di dawiyê de, sîstema Wilayeta Feqîh, Mehmûd Ehmedîmijad, mohreyê ravkirî yê rêberê nizamê, wekî Serok Komar destnîşan kir. Asta berçav a beşdariya xelkê li bajarên mezin û gerimkirina bazara wê şanoya nedemokratîk, ew şik û xeyale xiste nav hizra bi milyonan xelk, navend û çavdêrên siyasî yên li derveyî welat ku beşdariya xelkê di wê bi nav hilbijartinê de, dê guhartinan di sîstema Wilayeta Feqîh de misoger bike, lê bê hay ji vê çendê ku desthilata reha a Wilayeta Feqîh û endazyarîkirina hilbijartinan, zêdetir ji her demeke din dê bêhurmetiyê bi deng û xwestekên xelkê Îranê bikin. Eva ku bal Wilayeta Feqîh girîng nîne, dengê xelkê û beşdariya wan di diyarîkirina çarenivîsa siyasî a wî welatî de ye.

Di vê navberê de xelkê Kurdistanê weke her car pêşengî û hişyariya bilind a xwe di warê siyasî de nîşan dan û li şûn xapînokên sîstema Wilayeta Feqîh neçûn. Neteweya şiyar û mafxwaz a Kurd, şanoya hilbijartinên Komara Îslamî a Îranê baykut kirin û careke din bi hemû xelkê Îranê û cîhanê nîşan dan ku ji bo gihîştin bi maf û daxwazên xwe, ji xebatê mandî nabin û bi pîlanên Komara Îslamî a Îranê nahên xapandin. Di cihê xwe de ye, em spasê ji wî xelkê hişyar û welatparêz bikin ku bangewaza rêberên rastbîn yên siyasî û hêzên resen yên xebatê pejirandin û bi helwesteke yekgirtî û camêrane, careke din "NA" gotne rejîma Îslamî a Îranê û hemû xapînokên wê rejîmê.

Encama dehemîn dewra hilbijartinên serok komariya Îranê, careke din ev yeke selimand ku hemû cure hewlek ji bo pêkanîna guhartinan li Îranê, dubarekirina ezmûna şikestxwarî a berê ye û tenê xeyaleke bêencam e û hevdem xisarkirina hêz û şiyana xelkê azadîxwaz ê Îranê û xelkê mafxwaz yê Kurd e. Bê naverokî û nebûna şiyanê di bezandina hêlên sor yên sîstema Wilayeta Feqîh û yasaya bingehîn ya rejîmê ji aliyê guhartinxwazan ve, bêtir ji her demekê, di xurtkirina asta xemokiya siyasî û bêhêvîtiyê de û ji rê derxistina xebata siyasî û radîkal a xelkê li dijî sîstema Wilayeta Feqîh, di seranserê Îranê de toz û ax kiriye çavê xelkê guhartinxwaz û bêwatebûna bangewaz ji bo beşdarîkirina xelkê di vê şanoya sexte û derewîn de eşkere kir.

Ji aliyekî din ve hişyarî û asta têgihîştina bilind a xelkê Kurdistanê derheq derew û fêlên rejîmê, her di destpêka wê de, cihê serbilindî û lêhûrbûnê ye. Xebata mafxwazane a gelê Kurd bi dirêjiya dehan sal berxwedan û qurbanîdan û dijberî tevî dîktatoriya Îslamî li Îranê, nehêlaye ku pêgeha herî kêm ya civakî ji bo vê pêvajoyê li Kurdistanê bihê ewle û desteberkirin. Kifş û eyankirina kakil û naveroka pirojeya bi nav reformxwaziya dewletî weke beşeke cudanekirî ji sîstema Wilayeta Feqîh, heqaniyeta herî mezin a xwe di vê gerra dawiyê de, ber bi civata cîhanê da kifş û holê.

Em bi hemû xelkê Kurdistanê radigehînin ku emê di bûyerên girîng yên siyasî de li pêşerojê hewlê bidin ku ji her demekê pitir yekdengtir bin û yekîtiya bizava mafxwazane a gelê Kurd bihêztir bikin. Bê guman gihîştin bi mafên rewa û dîrokî yên gelê Kurd, ragirtina hêvî û bawerdarkirina bi milyonan civatên xelkê azadîxwaz yê Kurd, hêvênê gihîştin bi serkevtin û berdewamiya xebata bêrawestan ya me li dijî dîktatoriya Wilayeta Feqîh e.

Spas ji bo we keç û xortên şiyar ên gelê Kurd ku vê carê jî hûn bi fêlbazî û derewên Komara Îslamî a Îranê nehatin xapandin.

Pîroz be yekîtiya we di pêxema hewildana bêrawestan ji bo bidestxistina mafên we yên rewa.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê

Komeleya Şoreşger a Zehmetkêşên Kurdistana Îranê

24'ê Cozerdana 1388'an a Rojî

14'ê Hezîrana 2009'an a Zayînî

Doma Rûpela 1'an

...

Piştî heyamekê û di destpêka meha Tîrmeha 1989'an de, Burhan careke din bi **S** re têkiliyê çê dike. **S** daxwazê jê dike çend çekên sivik jê re amade bike û di heftiya yekem a Tîrmeha 1989'an de, bigihîjne destê wî. Di hevdîtina navbera Burhan û **S** de ku di balyozxaneya Îranê de dibe, bo cara yekemîn kesekî bi navê **Mihemed** dibîne ku weke **S** dibêje di sala 2005'an de bû Serok Komarê Îranê.

S dibêje, min bi wan re li hev kir ku 5 heta 8 çekên sivik ên otomatîk bayî 50 hezar dolaran ji wan re bikirim û piştî heşt rojan çek gehandine Viyenê û di balyozxaneya Îranê de çek radestî Burhan û Ehmedînejad kiriye.

3 salan berî niha jî şahidek bi navê D li Fransa hin zanyarî eşker kirin û da polîsê Austryayê ku diselimand rola Ehmedînijad di terorkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî de pirr zêde bûye.

Di dawiya wê Konferansa çapemeniyê de, Dr. Pîltz got: "Divê dewlet û Parlamentoya Otrîşê di çend rojên tê de helwestek ron û zelal bigre û li benda helwêsta dozger û aliyên qanûnî yên Otrîşê nebe, ji ber ku ew pirsek siyasî ye û pêwîst e siyasetvan helwêstên xwe diyar bikin û divê dosyaya terora Viyenê bikeve kar û dest bi lêkolîn û lêkolîn bihê kirin".

Xebata kurd bi soz û qewlên derew ji rê dernakeve

MÎTRA

Di dema coş û xuroşa paropagandaya şanogeriya hilbijartinê de, hinek qise û bas hatin holê ku piştî nişîna vê coş û xuroşê û wê qonaxa ajîtasyon û propagandayane, hewce dike helwêst li ser bihê girtin û bi durustî lê bihê fikirîn û pêwîst e ku aliyên wê basê bihên dahûrandin heta ku em bi başî di vê qonaxa ku em tê de ne, tê bigihîjin.

Ewa ku armanca basa me ye, ew propaganda û wade û soz bûn ku ji aliyê berbijarên Serok Komariyê ve li dor mafên neteweyan li Îranê yan bi gotina wan "pirsa qewman" kete rojevê û di vê derbarê de jî şêwara çandî ya rejîma Komara Îslamî biryarek pejirand ku di zanîngehan de di 2 wahidên êxtiyarî de zimanê "qewman" bihê dersdayîn.

Ew basên wan berendaman û ew biryara dezgeheke rejîmê, aliyê wan yê xurt dikeve çarçoveya propagandakirina serdemê bi nav hilbijartinan û di rastî de merema sereke a wan derewekirin digel xelkê bû. Heke em bi hûrî li wan bas û biryaran binihêrin, vala û bênaverokbûna wan ji me re derdikeve holê ku di doma vê nivîsarê de em dê biçin ser hilvedana perde li ser fêlbazî û wan durûşmên bêraverok, lê di pêş de hewce ye em nirxandin û dahûrandinekê li ser sedemên ketne rojeva mijareke wiha û cura îtirafkirin û xweanîna rejîma Komara Îslamî bi hebûna "pirsa qewman" bikin.

Di destpêka bidestvegirtina desthilatê û di rastî de tevî talabirina destkevtên şoreşê ji aliyê komekî kevneperest ya alîgirê Xumeynî, neteweya Kurd bi awayekî aştîxwazane xwestek û daxwazên xwe ku bi salan bû hatibû binpêkirin û hemû cure serkut û perçiqandinek bi dijî gelê kurd hatibû meşandin, anî berbas û piştî hiloşîna rejîma dîktator a Paşayetiyê, netewa Kurd weke neteweyên din ên Îranê daxwazkarê azadî û dadperweriyê bû, lê daxwaza aştîxwazane a Kurd bi agir û hesin û bi fermana cîhad û qirkirinê hate dayîn û ji wan salan ve ku rejîma Xumeynî êrîşeke berfireh kir bo ser Kurdistanê û hemû Kurdistan mîlîtarîze kir, heta niha herdem bas ji "Umeta Wahid a Îslamî" kiriye û di siyasetên xwe de, di qise û propagandayan rejîmê de bas ji yekbûna Umeta Îslamî û haşakirin ji hebûna pirsa netewî li Îranê hatiye kirin.

Bi dirêjahiya 30 salan haşa û înkarkirin ji hebûna mafê neteweyan li Îranê û nemaze înkarkirina pirsa neteweya Kurd, ev neteweya azadîxwaz, bi awayê cur bi cur û bi ziman Dû axavtinek cuda, xwe ji siyaseta faşîstî û qirker a rejîmê cihê kiriye û di hemû derfetekê de hebûna xwe selimandiye û qet ji xebata azadîxwazane û mafxwazane nehatiye veqetiyan.

30 sal xebata tev aliyane a Kurd li dijî Komara Îslamî û ji bîrnekirina maf û azadiyên wî gelî, Komara Îslamî neçar kiriye ku îtirafê bi hebûna dozeke wiha bike, helbet bi awayê fêlbazane yê xwe û bi merema kêmbihakirina daxwaziyên wî gelî û berteskkirina wan di çend xalên bênaverok de.

Di van çend salên dawiyê de û tevî hatne rojeva gellek guhartinên siyasî û guherîna hevsengiyên siyasî, dîplomatîk û stiratejîk, Komara Îslamî li hember hilkişan û bi gurrtirbûna

rejîma Komara Îslamî bi bask û bandên cuda yên xwe ve, niha piştî çendîn sal tepeserî, tawan, kuştin û malwêraniyê, dengê neteweyên Îranê û bi taybet neteweya kurd bi wan nehatiye fetisandin, û li bin zext û givaşên siyaseta cîhanî, deverî û navxweyî û ji ber xurtbûna xebata tevalî ya netewî li Îranê, cehd û tekoşîna kontirol, kêmkirin û bi larêdebirina xwastek û daxwazên netewên mafxwarî dide

daxwazî û mafxwaziya neteweya Kurd de hil ketiye.

Hiloşîna bilûka Soviyetê, rejîma Sedam, çespana Federalîzmê di sîstema siyasî a Îraqê de, hatina hêzên Amerîka ji bo herêmê û pirr guhartinên siyasî ên li pey wê hatinê de, û herwiha xurtbûna xebata netewî a Kurd di hemû parên Kurdistanê de û pêşdeçûn û berfirehbûna xebata netewî – demokratîk li Kurdistana Îranê û xelkîtirkirina wê xebatê ku em dikarin ji daxistina dukan û bazarên bajarên Kurdistanê bi hilkevtên cur bi cur û nemaze di bîranîna rêberê neteweyî, Dr. Qasimlo de bi ronî û eşkere bibînin, hemû ew guhartin in ku Komara Îslamî bi mecbûrî divê bibîne.

Di dema derbazbûyî de, navendeke ser bi yek ji dezgehên rejîmê, bi navê navenda xwendin û lêkolîna stiratejîk, raporek ji bo wê dezgehê amade kiribû ku ew rapor hate belavkirin û kete destê xelkê jî. Di wê raporê de, her çiqas pirr zanyariyên şaş jî têde hatiye baskirin û hewl û cehd hatiye dan heta di zanyariyan de jî hîle û çewaşekarî bihê kirin, lê bi neçarî îtiraf bi hebûna pirsa neteweyî di Kurdistanê de kiriye û her wiha îfade bi wê yekê kiriye ku doza kurd ji vê mezintir û berfirehtir bûye ku rejîm bikaribe bi derbelêxistin û tundûtûjiyê qir û bêdeng bike. Her çiqas di vê raporê de û di siyaseta rejîmê de doza Kurd bi pirsa "qewm û qewmçîtî" binav dikin û di rastî de dixwazin biçûk bikin û bêhurmetiyê pê bikin.

Di beşek ji vê raporê de, di rûpela 24 de hatiye:

"... guhrtinên hundirîn ên zû di çarçovaya "qewmçîtîya" kurdî li Îranê ji alî, şêwe û alavên xebatgêrî, edebiyata zal, awayê xebatê, rêberên tevgerê, mekanîzmên têkiliyê û wd... yê bûne sedema vê çendê ku qewmçîtî bi awayekî micid û xurt di civaka Kurdistana Îranê de dubare were berhemanîn û xurt û bihêz bibe".

Di beşa dawî a vê raporê de, basa awayê serederîkirin tevî diyardeyek bi gotina wan "qewmçîtî" dike û çendîn rêçareyên pirtîkî dixe hember rejîmê û sîstema Komara Îslamî:

Hemû ew base û rêkarên wê cihê lêhûrbîn û nirxandina taybetî ne. Heta siyaseta Komara Îslamî ji aliyên cuda xuya bibin, lê ewa ku li vir cihê basa vê mijarê ye, beşek ji wan rêkarane dişibin propagandaya serdemê şanogeriya hilbijartinan.

Di beşek ji wan rêkaran di asta deverên kurdakincî de dibêje:

"1.Tejîkirina valahiya aliyên fikrî û siyasî li herêmên kurdakincî ên Îranê û ..."

Armnc ji vê tejîkirina valahiyê ku piştre jî diçe ser awayên tejîkirinê ku ji aliyê mamostayên zanîngeh, hunermend û nivîskarên bi qewlê wan welatparêz ve, ewa ye ku ew hejmonî û gotara siyasî ku ji aliyê hêzên siyasî ên Kurdistanê ku li dijî rejîmê dixebitin, divê bihê şikandin û kes û aliyên ser bi rejîmê li ser navê gotara nû û çandî ve, di herêmên kurdakincî de propagandayê bikin û cihê wan hêzên siyasî bigrin û bîr û rama siyasî li Kurdistanê bikeve bin dest û kontrola

Dûm di rûpela 5'an de

RONÎ

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re

Ebdullah Hicab

Komara diz û derewînan

Dîmaneyên kandîdayên hilbijartina gerra 10ê ya serokkomariya rêjîma Komara Îslamî (heke nav jê danên hilbijartin!), ku di medyayên dewletê de hatin weşandin, pirr tiştên ku caran weke tabû an tilisim dihatin temaşekirin, anî rojevê. Ji dizî û derewên karbidestan re bigre heya netifaqiya di asta herî bilind de, yek li pey ya din bi zimanê hilbijardeyên Komara Îslamî hatin berbasê. Nîqaşên di navbera kandîdayan de, ligel ku encama hilbijartinê û çarenûsa welêt, her nebe carê naguhere, lê bi xwe ezmûnek nû bû. Encama hilbijartinên Komara Îslamî, piranî berî hilbijartinê diyare, lê her çi ba, ji niha û pê ve rêjîm bi lêgerên nû re rû bi rû kiriye. Du mijarên here berçav, bê qîmetbûna îdeal û pîvan û kesayetiyên ku di destpêka hatine ser kar a Komara Îslamî de ji Xumeynî nêzîk, û ya din mijara sextekarî, dizî û derewan bû. Pêşbînî tê kirin, di dema pêşiya me de pêvajoyek dest pê bike ku zehmet e Komara Îslamî bikare pêşiyê jê bigre. Serokkomarê nû yê Îranê her kî be, bila bibe, lê êdî nayê veşartin ku dema îdela û pîvanên ku Komara Îslamî dixwest di civaka Îranê de bi cîh bike, bi ser çû ye.

Di pêvajoya propagendaya hilbijartinê de agahî an mijarek nû derneket. Her çend berendaman pirr tişt li ser hev gotin û perdeya rûyê xwe û rêjîma xwe hildan. Lê ji bo neteweyen Îranê tu gotinek nû di wan nîqaşan de tune bû, ji ber ku her sê gotinên sereke yen di niqaşan de, anî; dizî, derew û sextekarî bi salan e weke beşek ji zat û kesayetiya Komara Îslamî lê hatine û tê zanîn. Lewma pêwîst jî nake di vê zincîre basê de ev babet, bi serê xwe, bibe mijara baskirinê. Lê hilsengandin û nirxandina hin warên nîqaşan derdixe ku asta kultûra siyasî ya Îrana îro li ku ye. Ev zincîre bas, dê awirekê bide rewşa siyasî, civakî, abûrî û siyaseta derve ya Komara Îslamî. Piştre dê hin helwêstên siyasî li hember pêvajoya hilbijartinê hilsengîne û karîgeriya wan helwêstan li ser rewşa niha û pêşerojê bîne berbasê. Di beşa dawî de hin pêşniyar ji bo pêngavên pêwîst bikevin rojevê.

Propagandaya hilbijartinê

Hilbijartina azad, kanala sereke ya xurtkirina bingeha demokrasiyê ye. Lê hilbijartina kontrolkirî ku di Komara Îslamî de birêve diçin, bi tenê emrazek din e ji bo xapandina civakê û binpêkirina pîvanên demokratîk. Komara Îslamî hem hilbijartinan kontrol dike û hem berî hilbijartinan diyar dike ka kî ji sindûqê serketî bê der. Di şanosaziya dawî ya hilbijartinê de jî ew rewş bi heman şîweyê diyar bû. Ji ber wê çendê, encama hilbijartinan tu giring nîne. Berî hilbijartinan çi bû, ya bûyî çi derxist û ji niha û pê ve kî çi dike, giring e.

Kêmasiya tunebûna demorasiyê her di destpêka pêvajoya hilbijartina serokkomariya Îranê de xwe nîşan da. Dezgehên ragehandina rêjîmê, di destpêkê de jêstek biwêrane girtin û xwestin nîşan bidin ku demokrasiya Komara Îslamî ji demokrasiya rojava kêmastir nîne. Lewma ji bo cara yekê di dîroka siyasî ya Îranê de, rêze duela navbera berendaman de weşandin. Lê hema di destpêkê de berhema wê kultûra siyasî, ku Komara Îslamî afirandiye, xwe nîşand da. Nîqaş li ciyê ku bikeve xeta baskirin li ser pilan û pirojeyên kar, bûne meydana bêhurmetîkirin û êrîş ji bo ser takekes, berendam û karbidestên niha û yên pêşîn. Xalên ku di pêvajoya propagendaya de balan meriv dikişandin, bi kinî ev bûn:

Nizimbûna asta kultûra siyasî û jarbûna metodên diyalogê

Her li destpêka nîqaşên di navbera berendaman de, encamên kultûra siyasî ya ku Komara Îslamî ava kiriye, di nîqaşan de reng veda. Tundutîjî di gotin û helwêst û kiryaran de, gotinên sar û pirr ji bêhurmetî, gef û çavtirsandin û hwd. Kultûra ku li ciyê rexne ji bername û pirojeyên kar, li ciyê bernameyên alternatîv, êrîşê dike ser kesan û aliyan, bi jiyan û îdealên Komara Îslamî ve girêdayî ye. Bi kurtî edebiyata siyasî ya Îranê ji bo vê gotara siyasî ya niha bûye bingeh. Her ji Xameneyî re bigre heya Ehmedînijad û pasdar û besîc û kopal bi destên wan, û li eniya din, ji Mûsewî û Refsencanî re heya şêwirmend û hevkarên wan, hemûyan weke hev kultûra siyasî ya Komara Îslamî bi kar anîn. Kultûrek pirr ji nefret, kîn, dijberî, fen û xap û sextekarî. Lewma pirr bi rahet ji hev re digotin "diz" û "derewîn". Niha yek ji wan "diz" û "derewînan" dubare bûye serok komar. Lê diyar e weke çawan xelk baweriyê bi rêveber û serokên rêjîmê nake, ewan bi xwe jî bawerî bi hev û din û bi gotin û siyaseta xwe nînin. Lewma kî tê ser kar, kultûra siyasî û qedera welat her weke xwe ye.

Bê rengbûn û têkçûna manaya durûşmên rêjîmê li ser exlaq û manewiyatê

Xumeynî û hevbîrên wî, Komara Îslamî li ser bingeha durûşmên dijî Amerîka û Rojava damezirandin. Di komara wan ya îdeal de manewiyata li gor pîvanên Wilayetê Feqîh û giringînedan bi jiyana dinyayî bingeh bû. Hêviya Komara Îslamî ev e ku xelk berê xwe bide destê îmam û muctehidê zane û alim û bi tenê guhdarî emr û fermanên îmam û rêberan be. Berendam û piştîvanên wan ji ber ku dizanîn ku reng û rûyê durûşmên Komara Îslamî tu qîmetek nava civakê de nîne, di pêvajoya hilbijartinan de, pirr kêm ev duruşm gotin. Mijarên abûrî, siyaseta derve û derew û dizî û netifaqiyên di navbera karbidestan de, rojeva sereke ya propagandaya hilbijartinê bû. Duela di navbera berendaman û nîqaşên sereke yên hilbijartinê, nîşan da ku ev durûşm û daxwazî tenê kultûra şidet û dijberiyê xurt dikin, lê kêrî civakê û birêveberiyê nayên û ne di rojeva civaka Îranê de ne.

Dom di R. 6'an de

rejîma Komara Îslamî.

Di xaleke din de pêşniyaz dike:

"3.Pêşîgirtin ji vê çendê ku zanîngehên Kurdistanê xwecihî bihên kirin".

Ku di rastî de armanca wê ewa ye xwendekarên Kurd li sernaserê Îranê belav bikin, bona ku derfeta xwerêxistinê bi wan nehê dayîn û her wiha ji cihên din ve xwendekar ji bo zanîngehên Kurdistanê bihên şandin bona ku fikirîn û kultûra Kurdî li zanîngehên Kurdistanê bihên perawêzkirin.

Di xaleke girîng a wan rêkarane de, di rûpela 29 de, dibêje:

"Xurt û pêşdebirina partîtiyê û pirsgirêkên bask û destekçîtiyê li deverên kurdakincî bi mirama rakêşana bala xelkê ji mijara herêmî û qewmî ve ber bi bas û mijarên giştî ên welat".

Eva ew bas û xala girîng e ku em dikarin di çarçoveya serederiya vê dawiyê a berbijaran de şirove bikin û bizanin ku berendamên destbijêrkirî ên rejîma Komara Îslamî çima bi çend qise û xalên bênaverok bas ji "qewmam" dikin. Di rastî de, her ew şerê zêrîngirî ye ku wan berendaman xiste rê û yek du daxuyaniyên bê naverok hatin dayîn û biryareke Şêwra Çandî a rejîmê jî hate dayîn, ji bo rakêşana bala neteweyên bindest û nemaze neteweya Kurd bo nava rikeberiya nava band û destekên rejîma Komara Îslamî bû û hêz û şiyana mafxwazane û azadîxwazane a Kurd ji kanala şerê baskî û bandî, talanker û tawanbarên rejîma Komara Îslamî vala bikin. Di wê çarçoveyê de û di doma wê siyaseta giştî de ye ku rejîma Komara Îslamî dixwaze bala xelkê ji daxwaziyên netewî û xwecihî ber bi navenda desthilatê rabikêşîne, bi erxayînî ve her li wan çend rojane propagandaya hilbijartinê bi dawî nahê û senaryo û şanogeriyeke din bidestve dibe û dê pîlanekn din dabirêjin bona ku bi qewlê wan kurd û netewên din bi desthilat û bi navendê ve girê bidin û daw û telikek din dê di holê de be heta bi rûçikeke rengkirî, bi sere dawekê ve xelkê Kurd bi mohre û bandeke rejîma Komara Îslamî girê bidin.

Lê neteweya kurd û hêzên siyasî yên qada xebatê, gellek ji vê yekê hişyartir in ku rê bi van çewaşekarî û kompiloyan bidin.

Di dawiyê de ji bo eşkerebûna bênaverokiya wan terze pîlan û bernameyên rejîmê ku dê di pêşerojê de jî birêve biçin, emê berhevdanek bilez bi ser du daxuyaniyên berbijaran û biryara şêwra çandî a rejîmê de bikin. Yek ji wan, daxuyaniya Kerûbî bû ku hinekê zelal û eşkeretir ji yê din qala kêmnetewan kiribû û emê îşare bi çend xalên girîng ji wan qewl û sozên derewîn ku wî dabû, bikin:

Yekem, di beşa paremayîbûna aboriya "deverên qewman" de, soz dabû ku "para wan ji desthilat û saman û pişikdariya wan li mafên siyasî, aborî, civakî û çandî li gor behre û hewcehiya wan dê bide".

Anku divêt wan behre û şiyana vê hindê hebin heya ku mafên siyasî, abûrî, çandî û civakî!! bi wan bihê dayîn û ew behre û şiyane jî divêt Kerûbî binirxîne!

Duyem: li hemberî wan madeyên yasaya bingehîn ya Komara Îslamî ku bi kêmî bas ji "qewman" kiriye û weke Kerûbî dibêje "Moetel" mane, dê hewlê bide ku kosp û astengên ser rêya wan bendên makezagonê hilgire!! Ew sozê nade ku dê wan cîbecî bike û îmkanat û xerca cîbecîkirina wan ewle û misoger bike, ji ber ku tenê hewil dide ku astengan hilbigre û ger jî nehatine hilgirtin, dê wan bi xelkê û dadgeha edalet a Xwedê bidim nasandin"!!

Sêyem: di parek din de Kerûbî ji bo mohreyên ser bi rejîmê li nav kurdan ku heya niha serê wan bê kilaw maye, soza vê çendê dide ku" Mifahstandin ji zerfiyeta hêzên jêhatî û bi ezmûn yên "qewman"!!

Çarem: di beşek din de li hember xwendin û nivîsandina bi zimanê zikmakî ew nek her qebûl nake, belku tenê soz dide ku astengên ser rêya mifah standin! Ji zimanê qewman di çapemenî û ragihandinên giştî û wanegotin bi wan zimanan di zanîngehan de hilbigre.

Pêncem: li ser xwendina kurdî di zanîngehan de dibêje ku dê astengên ser rêya xwendina xwendekarên kurd di zanîngehên din yên Îranê de hilbigre! Ku ev bende û rapora ku me li jor qala wê kir, gellek dişibin hev!

Di daxuyaniya Mûsewî de jî bi awayekî pirr bertengtir ji daxuyaniya Kerûbî çend xalên giştî û bê wate hatine ku hewlek zaf jî daye di çarçoveya edebiyata Komara Îslamî û Wilayeta Feqîh de darêje. Tişta herî girîng bal Mûsewî pirsa olî ye û di daxuyaniya xwe de jî wek rêçare dibêje: divêt em bawerîyê bi pirr qewmiyê bînin"!!

Her di çarçoveya wî awayê piropagendeya hilbijartin û şanogeriyê de, şêwra bilind a çandî ya rejîmê jî biryarek da û eva pesend kir ku bi zimanê "qewman" (Erebî, Azerî, Kurdî, Belûçî û Turkmenî) di zanîngehan de ders bê gotin, şêweya gotinê jî ewqas berteng kiriye ku tenê henek pêkirin e. Di vê biryar û birêvebirinê de dibêje: "Di zanîngehan de li van rişteyên dersî yên ziman û wêjeya farsî, 2 wahidên bijarte bo zimanê "eqwaman" bihê danîn." Yanî dibêje xwendekarek rişteya wêjeya farsî ku çar salan ew ziman xwandibe û bi tevahî şehrezayî têde hebe, dikare bi awayekî dilxwaz waneyek 2 wahidî ku tenê bo tirmek (nîvsal) xwandinê û ew jî heftiyê tenê demjimêrekê bixwîne.

Ev jî hemû dilxwaz e û ger wek çend sal berî niha ku hate ceribandin, ger di her zanîngehekê de û bo her tirmekê û ji bo her waneyeke dilxwaz hejmara daxwazkaran negihîje qasê hewce, ew wane dê bihê rakirin! Her wekî çend salan berî niha li Zanîngeha Azada Îslamî ya Kurdistanê her ew tişt pesend kirinûn û dîsan hilgirtin.

Bi vî awayî em bi vê encamê digihîjin ku rejîma Komara Îslamî bi bask û bandên cuda yên xwe ve, niha piştî çendîn sal tepeserî, tawan, kuştin û malwêraniyê, dengê neteweyên Îranê û bi taybet neteweya kurd bi wan nehatiye fetisandin, û li bin zext û givaşên siyaseta cîhanî, deverî û navxweyî û ji ber xurtbûna xebata tevalî ya netewî li Îranê, cehd û tekoşîna kontirol, kêmkirin û bi larêdebirina xwastek û daxwazên netewên mafxwarî didin. Ezmûn û ceribîna han jî nêzîk bi 30 salan berî niha hate cebandin, wê demê ku piştî êrîşa havane ya sipaha Xumênî bo ser Kurdistanê û berxwedana qehremanane ya kurdan, Xumênî bi neçarî daxwaza agirbest kir û mijûlê xwe amadekirin bona êrîşa bo ser Kurdistanê bû.

Di wê demê de jî bo bertengkirina daxwaziyên kurdan, cehdek bi vî awayî hate dayîn û mixabin taqimek 7 kesî ji PDKÎ cuda bûn, hin aliyên din jî hatin xapandin û bihev re çûne hembêza Komara Îslamî, lê neteweya kurd xebat û berxwedana xwe domand û ew taqim û aliyên xapandî ji aliyê rejîmê ve piştî midehek kurt ketne ber êrîşê, parek ji wan rêya caşatî û îxaneta bi gel hilbijartin, hin ji wan jî hatin bêdengkirin û dîrokê nirxandina xwe li ser wan kir û rejîmê jî hemû soz û qewlên xwe binpê kirin.

Niha jî piştî 30 sal xebata neteweya kurd, dîsan dê bi şanazî û serbilindî ve pirosesa rizgarîxwazane û azadîxwazane bidomîne û bi tu pîlanek Komara Îslamî naxape û xebata berheq a gelê kurd ji rê dernakeve.

Tunebûna pilana kar û pirojeyên siyasî

Her yek ji berendamên serokkomariyê di destpêka nîqaşên xwe de basî pilanên berfireh ên kar û projeyên siyasî dikirin. Lê di piratîkê de ji hin pilanên giştî yên abûrî bi der, pilanek siyasî ji bo guhertina rewşa welat derneket holê. Bernameya ku Mehdî Kerûbî ji bo guhertinê anî rojevê, tenê di çarçoveya durûşman de bû. Ji bo mijara mafê kêmneteweyan û grûpên olî û yên zimanî, rêçareya Kerûbî, Yasaya Giştî ya Komara Îslamî bû ku ji 175 xalan, 125 ji wan li dijî mafê mirovan, demokrasî û azadiyê ne. Pilanên abûrî yên Rizayî û mijara diyalog û nermiya di pêwendiyên bi cîhana derve re bi tenê berdewamiya siyaseta Refsencanî û piştre ji ya Xatemî bûn, ku tu ji wan di wan pilanên xwe de ser neketin.

Nebûna alternatîvan

Ev çar berendamên hilbijartinê, weke du alternatîvan xwe dane pêş, lê pilana wan ya kûr ji bo kar, di yek çarçoveyê de bû. Mûsewî hin derew û sextekariyên Ehmedînijad eşkere kirin û xwe weke dijberê wî anî pêş, lê nekarî weke alternatîvek siyasî derkeve hemberî Ehmadînijad û piştevanê wî yê xwedî desthilat, Xameneyî. Bi kinî, her çar kandîd li ser yek şopê dimeşiyan û dê di pêşeroja siyasî ya Îranê de jî her li ser yek xetê bimeşin, lê renge zimanê cuda bi kar bînin.

Desttêwerdana organ û aliyên xwedî desthilat

Dengê gel û daxwaziyên civakê ji bo karbidestên Komara Îslamî giring nîne. Lewma berî ku pêvajoya propagandayê dest pê bike û li dema hilbijartinê jî, hem Xameneyî, hem Sipaha Pasdaran û hemû dezgeh û desthilatdarên rêjîmê bi zimanê tûj derketin pêşiya xwesteka guhertinê. Hêzên Sipaha Pasdaran berî ku hilbijartin dest pê bike, bi eşkere gotin ku dê daxwaza guhertinê di qirka daxwazkeran de bifetisîne. Serokê olî û tu ji berendaman ji Sipaha Pasdaran re negotin ku "dengê gel pîvan e". Ji bo wan pîvan tenê parastina desthilat û yasayên Komara Îslamî ye.

Destnîşankirina kandîdayê desthilatê

Alîgiriya pirr vekirî û eşkere ya organ û dezgehên propaganda û ragehandinê ji kandîdayê desthilatê, Mehmûd Ehmedînijad, diyar dikir ku tê xwestin kî ji sandûqan derkeve. Encam berî hilbijartinan diyar bû…

Çalakekî Siyasî Yê Kurd Bi Cezayê Îdamê Hate Mehkûmkirin

Çalakekî siyasî yê Kurd bi navê **Husên Xizrî**, akinciyê bajarê Urmiyê, bi tometa propaganda li dijî rejîma Îslamî a Îranê û hevkarîkirin tevî yek ji partiyên Kurdistanî yên neyarê rejîmê, ji aliyê Taya yek a Dadgeha Şoreşa bajarê Urmiyê ve bi cezayê îdamê hate mehkûmkirin.

Li gor nûçeya Komeleya Çalakên Mafên Mirovan li Îranê, Husên Xizrî, payîza sala borî ji aliyê hêzên Ewlekariyê ve hate binçavkirin û pirraniya dema binçavkirinê de di hepsa takekesî a destbisergeha Îdareya Ewlekarî a bajarê Urmiyê de bûye. Navhatî li wir di bin givaşan de bûye.

Husên Xizrî di demekê de bi cezayê îdamê mehkûm bûye ku parêzerê hilbijartî yê xwe tunebû û her wiha derfeta berevenîkirin ji xwe jî tunebûye.

Hêjayî gotinê ye ku bi vê biryarê hejmara çalakên siyasî yên Kurd ku bi îdamê mehkûm bûne, gihîşte 13 kesan.

Mafê Mirovan

Nivîsîn: Peter R. Baehr
Wergeran: Mecîd Heqî

Rola Mafê Mirovan Di Siyaseta Dereve De

Hinek beşên Carnameya Cîhanî ya Mafên Mirovan di gellek peymanên navnetewî de hatine şirovekirin û ji aliyê Neteweyên Yekgirtî ve û gellek welatên cîhanê hatiye piştgîrîkirin: Li ser rewşa penaberan û kesên bê welat, mafên ramyarî yên jinan, mafê hemwelatitîya jinên xwedî mêr, qedexekirina koledariyê, qedexekirina firotina koleyan û bi hêza bizor ya kar, qedexekirina cudahîdananê di navbera mêr û jinan, qedexekirina cudahiyên regezî, mafên zarokan û hwd. Peymana dijî Îşkencê û Zulmên Din, Qedexekirina Îşkenceyên Ne Mirovane û Reftara Hovane di sala 1948'an de hat pesendkirin û li sala 1987 cîbicî kirin, mînakek nihayî ya li peymanên navnetewî ku dibine pirensîbên giştî ên ku cara yekem di Carnameya Cehanî de hat formolekirin.

Ew dîtinên ku gellek caran tê bihîstin, li ser wê ku hîna ew mafane li welatên ne-rojavayî nehatine cîbicîkirin, piranî hizrek bavsalarane ye: "mafê serbestiya raderbirrînê bo me rojavayiyan giring e, lê hûn xelkê welatên cîhana sêyem hîna negihîştine wê astê". Lewma gellek caran hatiye gotin ku welatên cîhana sêyem diviya berî her tiştan pêwîstiyên bingehîn yên jiyana mirovan wek xwarin û dermanan pêk bînin.

Hetanî ew hewcehiyên despêkî neyên pêkanîn, gellek zehmet e rêzgirtin li mafên sivîl û siyasî yên şarovendan bê rêzlêgirtin. Xasmayî dewletên dîktator gellek caran dibêjin hetanî xelkê welatê wan di feqîrî û hejariyê de dijî tu hewceyî bi mafên siyasî û sivîl tunînin. Ew wilo nîşan didin ku dixwazin rewşa civakî û abûrî ya civakê bêtir bikin.

Hinek gumanên cîhê xwe hene li ser armanca wan *dewletane* derbarê baştirkirina rewşa abûrî û civakî ya welatê xwe. Hetanî niha tu cihan nehatiye selimandin ku pêşgirîya mafên siyasî û sivîl ya xelkê bikaribe rewşa abûrî û civakî ya wana bêtir bike.

Tenê tiştê ku tê dîtin, bihêzkirina dewletên zordar e! Herwisa gellek kêm xelkê bindest yê dewletên zordar piştigriyê li zordariya dewleta xwe dikin. Di welatên wilo de, Carnameya Cîhanî ya Mafên Mirovan gellek li wê zêdetir tê hezkirin ya ku dewletên zalim dibêjin.

Bilî wê yekê du (2) peymanên mafên mirovan erkên cuda ji bo dewletan şirove dikin.

Rêzgirtin li mafên sivîl û siyasî yên mirov pêwendî bi geşekirina abûriye welatan nine. Gellek caran tu pêwendî û elaqeyekî mentiqî di navbera mafên sivîl û siyasî û geşekirina rewşa abûrî de nayê dîtin. Tu hegerek nîne, bo nimûne çima qedexekirina îşkence li welatên hejar û dewlemend ferq bê kirin.

Kurd Pira Navbera Turkiye Û Yekîtiya Ewropayê

Selîm Zencîrî

Pirsa kurd di Turkiyê de dozek kevnar e û eva bo 90 salî diçe ku dewleta Turkiyê haşa û înkara kurd di wî welatî de dike. Eva jî di halekê de ye ku di vê sedsalê de nêzîk bi 180 dewletên din yan di bin nîrê bindestî û dagirkeriyê de rizgar bûne, yan jî ji sîstema federaliyê ve ber bi xweseriyê çûne û hejmara wan niha gihîştiye 206 dewletan. ku mînaka herî nû jî Kosovo ye. Eva jî di halekê de ye ku nifûs û rûbera Kurdistana Bakur û fakterên netewî bi berhevdan tevî çendîn welat û dewletên xweser zêdetir e.

Bi giştî di vê midehê de dewleta Turkiyê bi hemû şiyan û karîna xwe û ji her derfet û alavekê bo jiholêrakirîna yakcarî a nasnameya vî gelê mafxwarî mifah standiye, kurd bi Turkên çiyayî nav birine, peyva **kurd**, **kurdistan**, **zimanê kurdî** û **navkirina zarokan** bi vî zimanî qedexe, bive û tawan zaniye, navê zêdetir ji 12000 gundan ji kurdî ve bo tirkî guhertiye, 4000 gundên Kurdistana Bakûr kavil kiriye, demografiya deverê têk daye, kurd ji cihwarên eslî yên xwe veguhastine û derbider kirine û dixwazin kurdan terorîze bikin, nêzîkî 10 000 kes heyanî niha bi tawanên siyasî ji nav birine. Ji aliyekî din ve jî 70000 kurd çekdar (caş – Qurûcû) kiriye heya ku şerê kurd bi kurd bide kirin û... hwd.

Lê li hember ew hemû zulm û zora dewleta Turkiyê û serbarê bedel û goriyên yekcar zaf, xebat û tekoşîna kurdan û serhildan li pey serhildanan meşiyane û heya qasekê karîne xwe ji pîlan û siyaseta bişaftin û helandinê biparêzin û berevanî ji ziman, çand û nasnameya netewî a xwe bikin.

Ev du sê dehsalên vê dawiyê, qonaxa herî dijwar û bixwîn ji bo her du aliyan li qada xebat û berevanî li pêxem asîmîlasyona yekcarî a kurdan di wî welatî de bûye ku ev jî vedigere ser siyaseta hov ya dewleta Turkiyê û berhema hewlên asîmîlasiyon û înkarkirina kurdan e ku jîngehek neewle ya siyasî, civakî di Turkiyê de li pey xwe re aniye û bi baldan bi zirar û ziyanên madî (dirangî), menewî û canî yên ku jê ketine, heya niha bi tu encamek dixwazî xwe negihîştine. Piştî derbasbûna ewqas salên tejî tawan û cinayet derheq kurdan, niha xêncî çareseriya aştiyane, tu metod û şêwazek din nemaye ku li ser kurdan nehatibe ceribandin. Lewra niha feza û etmosferek dilxweşker derheq çareseriya pirsa kurd derketiye rojevê û rewşa navxweyî û derveyî yên Turkiyê û hevkêşeyên siyasî çareseriya meseleya kurd bi ser dewleta Turkiyê de sepandine. Lewre ye ku niha em dibînin berpirs û karbidestên payebilind yên Turkiyê bi eşkere bas ji vê pirsê dikin ku pirsa herî girîng û mezin ya Turkiyê ye. Çunku di rastî de pirsa kurd, Turkiye di hemû warekê de lawaz kiriye û Turkiyeyek ku xwezyarê bihêzbûna xwe li deverê, endametî li YE'ê û parastina yekîtiya siyasî, civakî û tenahiya xwe be, neçar e xwe bide ber berê çareseriya vê pirsê. Her eva ye ku em dibînin Erdoxan dide zanîn ku helandin û ji holê rakirina nasname û qebûlnekirina kultûrên cuda di Turkiyê de helwesta faşîstan bûye û êdî gihîştine vê baweriyê ku guhertinê di siyaseta xwe de pêk bînin.

Her çiqas ku sala 1993'an ya Zayînî jî Turkut Ozal, Serok Komarê wê demê yê Turkiyê jî ji çareseriyê nêzîk bibû, lê dewleta kûr anku Ergenekonê bi terorkirina navhatî, dosyaya çareseriyê jî

arşîv kir, lê serdemê niha bi serdemê Qzal re pirr ferq heye û guncawtir e. Çunku kurd niha di perlemana Turkiyê de xwedî kom (ferasyon) ek taybet bi xwe ne (DTP) û herweha partiya desthilatdar jî, partiyek kemalîstî û nejadperest nine. Lewre niha bi destpêkirina dubare ya vê dosyayê, derfet û fersend heye ku partiya desthilatdar zend û baskên xwe lê hilde û xwe ji vî barê giran rizgar bike û ew şanaziya dîrokî jî bike nesîbê xwe. Çunku êdî raya giştî a Turk û kurd jî şer naxwazin û Turkiye jî vir şûnde tab û tehemûla bere janên vê pirsê nake (nagire).

Her di vê derheqê de em dibînin ku aliyê kurd wekî PKK û DTP û PSK û partiyên din li daxuyanîyên xwe de amadebûna xwe bo her terze hevkarî û hevfikiriyek di deheq çareseriya vê pirsê de ragihandine û bi taybet PKK bi agirbestên yek li pey yek yên xwe zêdetir hest bi berpirsiyariyê dike û ji vê derfetê bi başî mifahê distîne û pêşwaziya H. H. Kurdistanê jî ji vê agirbendê, pûte û girîngiyek zêdetir bi vê piroseyê dide. Em dibînin ku niha hin aliyên kurdî ji dirûşma xweseriyê bo çareseriya bi modela Skatlendê razî bûne. Lê wisa dixuye ku aliyê Turk modela Almanya bi baştir dibînin. Bi vê wateyê ku ew mafên ku turkên Almanya, ne li ser xaka xwe jê bi mifah in!, kurd jî li ser xaka xwe lê behremend bin.

Bo mînak mafê vê hindê hene ku navên dixwaz yên xwe li zarokên xwe bikin, bi zimanê zikmakî yê xwe bixwînin, azadiya Olî û avakirina rêxistin, navend û sendîkayan hene, herweha azadiya çap û weşana rojname, radyo û televîzyonan bi zimanê turkî hene û... kurd jî dikarin ew maf li ser xaka xwe hebin, lê bi hin guhertinan. Weke bikarneanîna tipên Q, X û W, herweha zimanê kurdî di dibistanan de bijarte û dilwaz be, nek fermî.

Lê ji aliyekî din ve helwstên nezelal û dijber yên her yek ji Serokkomar, Serokwezîr û Serokerkanê arteşê û domandina operasiyonên leşkerî û esmanî serbarê agirbirra PKK'ê û girtin û zîndanîkirina endam û berpirsên DTP'ê, şik û gumanê dixe ser hêviyê û herweha rastiya gavên wan derheq çareseriya aştiyane.

Lewra hewce ye ku dewleta Turkiyê bi hemû aliyên xwe, bi eşekere û zelal dev ji dubendî û durûyiya xwe ya siyasî, mercdanîn û xapandina xelkê berde û çi din bo çareseriya vê pirsa navxweyî ji derveyî xwe li pey negere û vê derfeta dîrokî ji dest nedin. Aliyê kêm di qonaxa yekemîn de, hewce ye çend gavan bo nîşandana rastiya niyeta xwe bigrin pêşberî xwe. Yekem Operasiyonên leşkerî yên xwe rawestînin, hêza çekdar a bi navê parêzerên gund (caş) hilweşînin, nivîsên li ser Çiyan yên ku "çi bexteweriyek e ku ez Turk im", ji holê rakin, lêborînek giştî der bike û derfet xebat û tekoşîna siyasî di hundir de pêk bîne, herweha girtiyên siyasî serbest bike heya ku derfet ji bo amadekirina destûrek nû li ser bingeha dadperwerî û wekheviya gelan pêk were.

Bi vî awayî jî him dê tenahiya navxweyî ya Turkiyê aram û misoger bibe, him jî dê yekîtiya siyasî, civakî a wê jî bihê parastin, herweha dê li YE'ê jî nêzîktir be naku kurd dê bibe pira navbera Turkiye û YE'ê.

Herweha dê di warê aborî de jî vêc û qazancek zaf ji neft û gaza herêmê ji rêya Mobako û kompaniyên xwe bidest bixe. Berevajî parehiştina vê dozê, dê nirx û bihayên siyasî, aborî, canî, wijdanî û ruhî yên zîdetir ji bo her du aliyan li peyre be.

Hilbijartinên Serok Komariyê Û Jinên Îranê

Perî Îslamniya

Çend rojan berî niha anku roja înê, 12.06.2009'an, hilbijartina Serok Komariya rejîma Îslamî a Îranê bi dawî hat. Di vê hilbijartinê de ku pitir ji 470 kesan xwe ji bo Serok Komariyê berbijar kiribûn, ji aliyê Konseya Parêzvan ve tenê selahiyeta 4 kesan bi navên Mehmûd Ehmedînejad, Mêhdî kerûbî, Mîrhusên Mûsewî û Muhsên Rizayî hate erêkirin. Di nava van 4 kesan de 2 kes bi navên Mûsewî û Kerûbî xwe bi guhertinxwax dan nasîn û dirûşmên guhertinxwaziyê girtine pêş û du kesên din bi navên Ehmedînejad û Rezayî jî mohafizekar bûn**:** Em di vê nivîsarê de dixwazin zêdetir li ser bi nav guhertinxwazan bisekinin. Ger mirov bi başî zaniyarî li ser sîstema rejîma Komara Îslamî a Îranê tunebe, zû dê were xapandin. Ma ne raste ku çend sala berî niha jin û ciwanîn Îranê bi dirûşmên derewîn ên Xatemî hatne xapandin. Jin û ciwanên Îranê bi hêviyek pirr mezin hem di hilbijartina serok komariya di sala 1376'an (1997) de û hem di sala 1380'an (2001) de beşdarî kirin hilbijartinan bûn û çûne ser sindoqên dengdanê. Helbet ne ji ber Xatemî, belku ew têniyê azadiyê bûn û Xatemî jî ew yeka bi başî dizanî û bi dana dirûşmên azadîxwazane xelkê Îranê xapand û kişande ser sindoqa dengdanê. Di asta navnetewî de jî dewletên biyanî nemaze welatên Ewrûpî jî bi sedema vê yekê ku ji sîstema Komara Îslamî a Îranê zaniyariyên zaf tunebûn, Xatemî weke mirovek guhertinxwaz mêze dikirin û van jî bi hêviyek mezin peşwazî ji Xatemî kirin. Lê mixabin Xatemîyê reformxwaz jî her weke axundên din dema ku hate ser kursiya

Dîmenek ji êrîşa hêzên rejîma Îranê bo ser xelkê nerazî piştî encama hilbijartinan

desthilatê, dirûşmên xwe ji bîr kirin û piştî ji hemû ew soz û qewlên ku dabû xelkê kir. Piştî Xatemî Ehmedinijad singê xwe da pêş û bi dirûşma," Ez piştevanê zehmetkeş û hejarên Îranê me" hate meydana hilbjartinê. Lê di doma 4 sal desthilatdariya Ehmedînejad de jî, wî li cihê vê yekê ku perê petrolo, anku dahata netewî bîne ser sifrên xelkê, şande derveyî sînorên Îranê ji bo têkdana ewlehiya herêmê û piştevanîkirin ji destek û taqimên terorîst ên weke Hizbulaha Lubnanê, Hemas û...

Bi hebûna wan hemû belge û azmûnên ku jinên Îranê ji vê rejîmê û beşdarbûna xwe di hilbijartinan de hene, lê mixabin mirov dîsan dibîne ku beşek ji wan bi dirûşm û sioganên derewîn ên ji aliyê kesên weke Mûsewî û Kerûbî ve dilxweş in, di halekê de qanûna bingehîn û qanûnên din ên vê rejîmê astengên herî mezin ji bo daxwaziyên wekhevxwaziya jinan in. Lê vê gerrê serbarê beşdarîkirina xelkê Îranê di hilbijartinan de (tenê Kurdistana Îranê nebe) û herwiha li gor çendîn rapirsiyan ku di bajarên cur bi cur ên Îranê de hatine encamdan, Mûsewî pitir ji %60 dengan anîbû, lê çima Ehmedînejad bû Serok Komarê Îranê?!

Li vir ji mirov re derdikeve ku rejîma Îranê heta rêz ji bo dengê xelkê nagire û negirtiye, ji beşdarbûna xelkê tenê û tenê ji bo berheqîdan bi desthilata xwe di asata navnetewî de mifahê distîne û dengê xelkê weke alevekê bikar tînin, nek ji bo diyarîkirina çarenivîsa wan.

Lê pirs ewa ye: Gelo ger Mûsewî yan Kerûbî hatiba hilbijartin, dê karîban soz û qewlên xwe bi cih anîban?! Bersiv rohn e, bê şik van du kesan nedikarîn sozên xwe bi cih bînin, çimku di rastî de wan her bi xwe jî nedixwastin vê yekê bikin. Bona îsbatkirina vê yekê hewce ye jinên Îranê berî her tiştî karnameya wan du berbijaran bixwînin û şirove bikin, vê demê dê ji wan re bi rohnî derkeve holê ku deng dane kî! Jinên Îranê divêt li xwe pirs bikin ku gelo heya niha ev guhertinxwezane li kuderê bûne. Başe çima wan tenê bo carekê kiryarên gemar û dijî mirovî ên rejîma Îranê weke îdamkirin, kuştin, îşkencekirin, dûrxistin, pêkanîna xizanî û fehşayê û wd... di Îranê de mehkûm nakirine?!

Jinên Îranê vê carê jî hinek daxwaz ji berbijarên bi nav reformxwaz kirin, dema ku mirov çav ji wan daxwaziyan dike, zû ji mirov re derdikeve holê ku mixabin dîsan asta daxwaziyên jinên Îranê ne bilind û bingehîn in. Xwastekên jinan en sereke evane bûn: Divêt Îran Carnameya Navnetewî a xebat li dijî cudahîdanana zayendî bipejirîne û çend xalên weke 19,20,21, û 115 ya qanûna bingehî ya rejîma Îslamî ya Îranê biguhere.

Lê di rastî de ger rejîma Îranê van mercan qebûl bike, wê demê rejîmek bi navê rejîma Komara Îslamî namîne, lewra hêvîdarîbûn bi guhartinên kûr û rastîn di çarçoveya vê rejîmê de xewn û xeyal e.

Kurdên Koçber Yên Rojhilata Kurdistanê, Di Navbera Sînorên Îraq Û Urdinê Girev girtin

Roja şemî, 13'ê Hezîrana 2009'an, kurdên koçber yên Rojhilata Kurdistanê, ji bo nîşandana nerazîbûnê li hember biryara şandina wan bo axa Îraqê ji aliyê hukûmeta Îraqê ve, dest dane gireveke giştî.

Nûçegihaniya Kurdistan'ê di vê derbarê de ragihand ku ew kurdên koçber di navbera sînorên Îraq û Ordunê de di rewşeke aloz de dijîn. Çend rojan berî niha parêzvanên sersînor yên Îraqê, bi Komîteya Koçberên Kurd Yên Rojhilata Kurdistanê ragihand ku hukûmeta Îraqê kar û barên veguhastina wan bo kampa Elwelîd li ser sînorên Îraq-Sûriyayê û li wir jî bo Îraqê tevav kiriye. Qirar e heya çend rojên tê, koçberên han ber bi Îraqê bihên veguhastin.

Ji roja yekşem, 14'ê Hezîrana 2009'an ve, 9 kes ji wan koçberan girev girtine. Hêjayî gotinê ye ku koçberên han nêzîkî 20 salan e ku di kampa Eltaş a Îraqê de dijîn û di destpêka sala 2005'an a Zayînî de bi sedema nebûna ewlehiyê û gefa girûpên tundrew û şovenîstên Ereb ji wan, bi armanca derbasbûnê, rêya welatê Urdinê dane ber xwe. Lê heya niha jî ne hukûmeta Ordunê îzna çûne nav wî welatî dide wan û ne Komîsariyaya Bilind a Koçberan ya Neyeweyên Yekbûyî hevkariya pêwîst tevî wan dike.

Dîmenek ji gireva penaberên Kurd ên Rojhilatê Kurdistanê li ser tixûbên navbera Îraq û Urdinê

JIYAN Û MIRIN

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com

Jiyan, ji aliyê daringî ve pêvajoyek e sînordar û demdemî, belê ji aliyê arişî ve bê sînor û bêdawî ye. Mirin jî, ji ber ku sînordariya jiyanê bi mirov dide fêmkirin û wateyeke giran li jiyanê bar dike, ew jî tiştekî gelekî girîng û manîdar e.

Her tişt bi dijberê xwe li wateyeke têgînî ya kûr û giring dadigere. Her têgîn bi dijwateya xwe manîdar dibe û tê fêmkirin. Jiyan û mirin jî du têgînên dijber û lêkneker ên ku bi hev û din ve girêdayî ne. Yanî jiyan, bi mirinê û mirin jî bi jiyanê watedar dibe. Ji aliyê fîzîkî ve, ev herdu tişt ji hev û din re dibin sînor; lê ji aliyê giyanî ve ev her du jî wekî du dijminên hêzdar li hemberî hev û din şerekî lêkneker dikudînin. Hemû tişt dijberê xwe di xwe de dihewîne. Yanî em dikarin bibêjin, hemû dijber, heta demekê bi hev re belê li hember hev dijîn. Belê şerê navbera wan û lêknekeriya wan bê westan û rawestan didome. Wekî hemû dijberan ligel ku jiyan mirinê û mirin jî jiyanê di xwe de dihewîne jî, dîsa yek dibe hûtê ya din û wê dadiqurtîne.

Jiyan û mirin; wekî du dijmin û dijberên qedîm, tim li hemberî hev şer dikin. Şerê jiyan û mirinê şerê hebûn û nebûnê ye. Di dawiya vî şerî de kîjan bi ser dikeve, ew serê ya din dixwe. Şerê navbera hemû dijberan bi vî awayî didome. Bo nimûne: Îro şerê navbera tevgerên aştîxwaz û hêzên şerûd û şerxwaz, şerê jiyan û mirinê ye. Têkoşîna tevegrên azadîxwaz û mafparêz, têkoşîna rizgarkirina mirovahiyê û têkoşîna bidestxistina jiyaneke nû û nûjen e. Bi kurtayî mirov dikare bibêje, berxwedan, serhildan, raperîn û têkoşîna wan ya li hember pest û kotek û çewsandinên tund û dijwar, nîşana jiyanê; belê bêdengî, xwesparî û radestbûna wan jî nîşana mirinê ye. Derheqa vê yekê de Bailey wisa dibêje: "Ne girîng e ku em çiqasî dijîn; a girîng ew e ku em bi çi awayî dijîn." Rast e. Ne ewqa muhîm e ku mirov çi qasî dijî. Ya muhîm ew e ku mirov ji bo çi an bi çi awayî dijî.

Jiyan, tenê ne hilmdayîn û hilmstandin e. Jiyaneke bênirx û bêrûmet, wekî barê mirinê ye. Yên ku xwe didin bin vî barî an jî naxwazin vî barî ji ser stûyê xwe bavêjin, dê ew rojê sed carî bi mirinê re rû bi rû bimînin û bi mirin û miriyan re rabin û rûnên. Ango dê ew bi mirîtî bijîn. Divê gel û kesên bindest û bintûte, bi rêxistin û bi biryardarîyeke xurt dest bidin hev û jiyaneke nirxdar û rûmetdar. Îro, mirovahî, li navenda cîhanê, di Rojhilata Navîn de û li Mezrabotan, ji nû ve di dergûşa şaristaniyê de doş dibe. Divê gelên Rojhilata Navîn li hemberî mirina kerr û kor û lal tovê jiyanê bireşînin ser vê erdnîgariya qedîm; qey ku jiyan li ser vê xaka pîroz û adan ji nû ve zîl bide. Tovê ku bi destê bav û bapîran hatibiye reşandin, îro li ser koka xwe şîn dibe û li ser xaka bi hatinî û bê xêr û ber, şax vedide. Ev şaxan, şaxên jiyana bêsînor û bêmirin e. Li aliyê din jî dijminê jiyan û mirovahiyê bi hemû hêz û derfetên xwe, xwe li karê jiholêrakirina gelan girê dane. Ne xem e. Mirina ku ji bo jiyanê û di rêya jiyanê de be, dê li hember jiyaneke mirî tim û tim bi ser bikeve. Civat û civakên ku nizanibin bimirin, dê ewê nikaribin bijîn jî. Wekî ku li jorê jî hate diyarkirin; jiyan bi mirinê û mirin bi jiyanê watedar dibe. Belê jiyan û mirineke çawa? Ji bo wê divê mirov van herdu têgînan baş fêm bike û wan ji nû ve hilde dest û rave bike. Di mercên îroyîn de, wisa bûye ku her gav rêya hezkirina jiyanê, di mirinê re derbas dibe. Wekî ku şehîdên rojiya mirina mezin jî (li girrtîgeha Amedê) digotin "Em ji bo jiyaneke birûmet diçin mirinê..." Rast e. Jiyan di mirinê de veşartî ye. Lê herkes nikare bigihîje vê raz û sirê. Divê ku mirov bizanibe di wateya jiyanê de bigihîje; girîngiya jiyanê di dil û mêjiyê xwe de, belê bi awayekî rastîn, bihishisîne; ango ji jiyanê hez bike. Herkes dibêje:" Ez ji jiyanê hez dikim." Gelo çend kes dizanin wateya jiyanê çi ye an çend mirov dikarin qîmetê bidin jiyanê? Qey herkes dikare mebesta girîngpêdana wê fêm bike? Bi rastî ew ne tiştekî asan û ketberê ye ku her mirov bikaribe wate û girîngiya jiyanê fêm bike û bibe layiqî wê. Mirov dikare bibêje ku jiyan, ji bo mirovî/ê aştî, azadî û serxwebûn bi xwe ye.

Mirovê/a ku ne azad be, nikare bi serbilindî bijî û behsa hebûn û kesayetiyeke azad bike.

Berî ku mirov bibe xwediyê tevger, bizav û pêwendiyên azad, divê bibe xwediyê dil û mêjiyekî azad û serbixwe. Dîsa kesên ku dil û mêjiyên wan dîl hatibe girtin, ne pêkan e ku têkiliyên wan ên rojane û civakî serbest û jidil bin û ew kes dikaribin ji bo xwe û bi vîna xwe tev bigerin û bijîn.

Kaniya Helbestan

Bendewarî

Hejarê Kurd

Li dûrî te
Nêzîk
Di
Himbêza
xweda
Li ser destan
Xewnê te
Di dilda
Dilorînim.
Li dûrî te
Çi roj dirêjin
Çi meh nayên
Hejmartin
Çi jiyan
Di şûna xweda
Dizîvire,
gêje gêj
li bin guhî
hevdikeve.
Li dûrî te
Nêzîk
Tu dev ji
Sawêrê min
Bernadî.
Li dûrî te
li ser
sîngê te
nêzîk
hîn
şûna lêvê min
mora evînê
nîşandabû,
hîn zindîbû
hîn ne ziwabû
li dûr
nêzîkîya
te
dihindirê
minda
jîyandibî

Yarmetîdana xelkê bi TISHKê,Ronîkirina Tîrêjên hevîyên aştî, Azadî û demokrasiyê di nava dilê gel de ye

Rojen ji welat

Heyamek dibe em dibînin ku televîzyona "TISHK" di bernameyên xwe yên rojane de, daxwaza hevkariyê ji xelkê Kurdistanê dike.

Piştî şêst û çend sal xebata rewa û mafxwazane ya PDKÎ û gelê kurd û gorîkirina hezaran keç û xortan, derbiderî û malwêranî, rev û wd... li Rojhilatê Kurdistanê, "TISHK" yek ji destkevtên herî giring û bi nirix di wê beşa Kurdistanê de ye.

Tişta ku zêde balkêş e û ez dixwazim li ser bisekinim, ew e ku hindek kes hewl didin hewcehiya malî û abûrî ya rêveberên wê kanala kurdî bikin kêmasî û alavek bo xerabkirina nav û heybet û hêmaya "TISHK TV" û karmendên wê û...

Lêbelê ez wekî hevwelatiyekê ku di hundurê welêt de dijîm û kêm û zêde haya min li derdora xwe heye, di alîkarîxwastina "TISHK TV"yê de ez ne tenê kêmasiyekê nabînim, belkû tiştek normae kanalek xelkî alîkariyê bixwaze û hêz û qaweta xwe ji gelê xwe bistîne. Neku penayê bo neyar û dujminan bibe.

Dîrok bo me derseke mezin û bi nirx e û bi rohnî eşkere dike ku pilingê Agirî, Êhsan Nûrî Paşa, girêdayê dewleta fêlbaz û riwîsifet û xwînmij ya paşayetiya Îranê bû û şahê Îranê bi rihetî ew firotne hindek dar, kevir û qîfarên çiya û bû sedema ji nav çûna şoreşê. Ya din penaberî û koçberbûna hezaran jin û mêr, zarok, pîrr û kal ên kurdên Başûr bo Îranê bi sedema birrîna yarmetiya malî û nedana çek û teqemeniyan bi pêşmergên fermandehê nemir û çepera berxwedanê, Mela Mistefa Barzanî ji aliyê wê dewletê ve bû.

"TISHK TV" mîna rojeke geş ku di her tîrêj û tavên newreqa ronahiya wê de hejarî, feqîrî, derbiderî, êş û jana bindestî û êxsîrî, berxwedan, kultûr, dîrok û... ya gelê kurd li Rojhilatê Kurdistanê tê dîtin; nîşanê xelkê cîhanê dide û wekî qelemekê di nava çavê dijmin de ye.

Xelkê Kurdistanê yarmetîdan bi "TISHK TV" ne tenê bi yarmetî û destgirtin ji wan nizanin, belkî wî karî dikin ku dizanin "TISHK TV" jî mînanî xebatkarên xwe ên çeleng û bi cerg, yarmetîder û piştîvanê gelê xwe ne û egîd û mêrxasên rojên hawar û tengasiyan in.

Em gelê kurd "TISHK TV" ne wek kanalekê nabînin bo sergermkirin û tijîkirina dema bêşoliya xwe, jiberku em wek alavekê dibînin ku reng û deng û hêmaya jiyana me ji cîhanê re diweşîne, û tirbûnek e ku qîrîna bêdengî û belengaziya neteweyekî bindest li Îranê belav dike. Lewre hebûna wê, hebûna me ye. "TISHK TV" çirayeke ron û zelal e ku di şevên tarî de di malên hevwlatiyan de, diçirûske û ronahiyê dide der û dorê û çav û guhên gel vedike û dibe nîşanderê rêya jiyan û hêviya berxwedana wan. Eger ew çira bitemire û ronahiyê nede, tê wê wateyê ku çav û guhên xelkê Kurdistanê tên girtin, Mirovêa bê çav û guh jî mirî ye. çûnku TÎSHK berhema xwîna şehîdan e, hêvî û çavroniya dayîkên cergsotî ye, berhema xebat û qorbanîdana çendîn salî ye, jivangeha evîndarên aştî, azadî û demokrasiyê ye, deng û rengê berevanker, heqxweazî û hawar û nalîna mezlûman ji destê zalim û sitemkaran e, rûgeha azadîxwaz û wekhevîxwazan e, dermanê birîn û êş û janan e, nîşanû berjeng û sembola şoreşvanan û qelemê çavê dujminan e, Tîshk deng û rengê pêşmerge û hemû tex û qatane, TISHK kenî û şadiyê dixe nav dilê zarokan, hêviyê dide bindestan û gulle û tîran direşîne dilê dujminan.

Rêveberên "TISHK TV" baş dizanin ku xelkê çi car ew tenê nehêlane û nahêlin û vê her ciqas pêşkêşî û yarmetiyên gel zêdetir bin, eyan dibe ku baweriya wan bi rêbaza Tîşkê zêdetir e û çavnihêriya xizmeteke zêdetir û berfiretir dikin.

TISHK Tv eger hejar û destkurt e, ji ber vê yekê ye ku ew parêzvanên gel û neteweyek hejar Û bindest in. Lê tişta ku gellek balkêş û bi qîmet e, ev e ku gelê kurd li Rojhelatê Kurdistanê bi hebûna ew hemû zext u zordarî, şer, malwêranî, hejarî û destkurtî yê, çi car aliyê li pişt TISHK ê ji bîr nekirine û pişta wê vala nehiştine û di her şert û mercekê de hevderd û xemxwarê hevdu bûne û tu hêz û ba û bahozek jî nikare wan ji hev beqetîne, çunku Tîshk yanî gel.

Hêviyek din bo heskîfê

Ji bo Heskîfê ku bi avakirina Bendava Ilisuyê re bi tunebûnê re rûbirû ye, dem derbas dibe.

Rojnameya çep-lîberal Frankfurter Rundschau ku li Almanyayê weşanê dike angaşt kir ku Almanya, Swîssre û Avusturya ji bo avakirina Bendava Ilisuyê dev ji dayina krediyê berdane. Piştî hat têgihiştin ku Tirkiye dê nikaribe 153 şertên ji bo dayina krediyê heya 6ê tîrmehê bi cîh bîne, hêviyeke din çê bû ji bo Heskîfê.

Di nûçeya Frankfurter Rundschau de tê bibîrxistin ku ji bo Tirkiye ji van her sê welatan bikaribe 450 milyon euro kredî bigire, di çileya 2008'an de, 6 mehê din dem girtibû û li gor vê diviya Tirkiye heya 6ê tîrmehê 153 şertên mîna avahiyên dîrokî yên Heskîfê bar bike ciyek din, ji bo şêniyên li herêmê wargehên nû ava bike û ziyanê nede xwezayê, pêk bîne, lê li gor lêkolînên ku hatine kirin, ta niha van şertan pêk neaniye.

Di vê navberê de kampanyaya îmzeyan ku ji aliyê Komeleya Xwezayê ve tê birêvebirin û daxwaza ku Heskîf mîna mîrata Xwezayî û Çandî ya Cîhanê ya UNESCOyê bê pejirandin, didome. Koordînatorê kampanyaya Komeleya Xwezayê Erkut Erturk got: "Saziyên ku kredî didin, 153 şert dabûne pêşiya Hukûmeta Tirkiyeyê.

Di nav demê de ji aliyê Ewropayê ve jî hat zanîn ku ev şert dê nikaribin bêne pêkanîn. Em jî banga xwe ya ji Hukûmeta Tirkiyeyê re ku Heskîf mîna mîrata Xwezayî û Çandî ya Cîhanê ya UNESCOyê bê pejirandin, nû dikin".

Heya niha ji welat û derî welat bi dehhezaran kes destek dane kampanyaya îmzeyan.

Çavkanî: ANF NEWS AGENCY

Werger: Amîda Kurd

ÇALAKIYA GUHERTINA NAVÊN CIH Û WARAN

Ji bo şûndestandina navên Kevin yên cih û waran, gava yekem hat avêtin. Li gundek girêdayî qeza Midyadê, muxtarê gund doza guhartina navê gund kir.

Bi awayekî fermî daxwaznama xwe da Wezereta Navxwe û Wezereta Çandê.

Navê gund yê kevin Habsunnes e. Dema navê gund guhertin û kirin tirkî, navê gund bûye Mercîmekli(mercimek= Nisk).

Ev daxwaza fermî ya yekem e ku çêbûye. wisa dixuye ku ev yek dê bibe destpêka daxwaza guhartina navên cih û warên xwe yên kevin

Keça Kurd li Rûsiya bû 1'mîn

Di programa "Pêşbirka Stêrkan" de ku li Rûsiya birêve çû, keça Kurd (Zara) yekemîn derket. Zara di deng û performansa xwe de bala her kesî kişand û dereceya yekemîn bi dest xist. Ev serkeftina Zara bû sedem ku ew li Rûsiya bibe stêrkek û di rojeva medyayê de bimîne. Zara di kovara magazînê "Atmosfera" de ku li Rûsiya gelekî meşhûr e, got: Ew di mala xwe de bi kurdî diaxifin. Zara keçeke Kurd e û berî salên dûr û dirêj ji Ermenistanê bar kirine Moskova yê.

Jêder: Avesta

Qesra Îshaq Paşa, dê bi cam bê parastin

Qesra Îshaq Paşa ya li Bazîda navçeya bajarê Agirîyê, ji bo ku ji tav û baranê zerarê nebîne, dê bi camek 7 hezar mîtroqareyî bê pêçandin. Qesra Îshaq Paşa, ku avakirina dê di navbera salên 1687-1784'an de tewaw bûye, wê havînan ji tavê û zivistanan jî ji baranê, bi vî awayî bê parastin. Qasê ku rojnameya "Yeni Şafak" radighîne, Midûrê Tûrîzm û Çandê yê Bajêr, Muhsin Bulut, dibêje xebatên restorasyona Qesra Îshaq Paşa, ku 5 kîlometr ji Bazîdê dûr e, berdewam e. Bulut, dide zanîn ku tevahiya qesrê, dê bi 7 hezar metreqare camê bê parastin.

Bulut: "Dema berf bibare, dê bi alîkariya sensorên germahiyê êvaran bihele û bi saya cihokan jî, dê biherike derveyî qesrê. Bi vî awayî ava berf û baranê dê zerarê nede temelê avahiyê."

Bulut, dibêje ev xebatên wan, dê di nava sê mehan de biqede û bi merasimek mezin dê rûyê nû yê qesrê pêşkêşî ziyaretvanan bikin.

Yaşar Kemal jî piştgrî da Hesenkêfê

Piştî wê ku gellek rewşenbîr, nivîskar û hunermendên mîna Tarkan, Orhan Gencebay û Orhan Pamuk, romannivîs Yaşar Kemal jî bi îmzeya xwe piştgirî da Hesenkêfê ku mîna Qada Mîrata Cîhanê ya UNESCO-yê bê îlankirin.

Yaşar Kemal, sedemê piştgêdayîna xwe ya kampanyaya navnetewî ya îmzeyan weha da eşkerekirin: "Civakên li çand, xweza û dîroka xwe xwedî dernekevin, dê nikaribin li ser lingên xwe bisekinin. Tunekirina xwezayê, tawana herî giran e û ev yek bi tu awayî nayê bexşandin. Yên ku xwezaya xwe wenda dikin, mirovahiya xwe jî wenda dikin. Çêkirina bendavan, rê li ber zuwabûna axê û nexweşiyan vedike. Eraziyên herî baş yên zîreetê, qeraxên çeman e û bendav, vê yekê tune dike.

Bendavên bê zanebûn tên çêkirin, yek ji sedemên tunekirina xwezayê ye. Li Hesenkêfê (Eskîfê), dîrok û xweza ji hev nikare bê veqetandin. Pêşniyarên kolandin û barkirina cihek din a dewlemendiyên Hesenkêfê, ku ne mimkûn e, tunekirina mîrasek cîhanê ye."

Di daxwaznameya kampanyaya îmzeyan de, ku ji aliyê Komeleya Xwezayê-(Doğa Derneği) û Kovara Atlasê (Atlas Dergisi) ve hatiye destpêkirin, tê gotin: "Heger li Hesenkêfê bendav bê çêkirin, dê 300 cihên arkeolojîk di bin avê de bimînin û herweha jiyana jîndarên tenê li wê derê dijîn, dê bikeve bin xetereke mezin. Hesenkêf, li gor 10 kirîterên UNESCO yên mîrata cîhanê, 9-ên wan bi cih tîne.

Daxwazname, dûre dê bi îmzeyên hatî komkirin pêşkêşî Serokwezîr Recep Tayyip Erdoğan û serokwezîrên welatên ku dê qrêdî bidin vê projeyê, ji Serokwezîra Almanyayê Angela Merkel, ji Serokwezîrê Nemsayê Werner Faymann û ji Serokwezîrê Swîsreyê ji Hans-Rudolf Merz re bê şandin.

rizgarionline

agiri

Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat: AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

E - Mail:
agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com

Piştî Hilbijartinê, Xelkê Serhildan Kir Û Rejîma Îranê Bêrehmane Xelkê Nerazî Serkut Dike

Piştî ragihandina encama şanoya hilbijartinên gerra dehem a serkomariyê di Îranê de û sextekarî û îlankirina hejmarek ecêb û bawer pênekirî û dûrî çavnihêriya hemû aliyekê, nemaze dengê 24 milyonî yê Ehmedînijad!!!, xelkê bona nîşandana nerazîbûnê li hember vê hejmara sextekarî û dûr ji rastiyê dest bi serhildanê kir û zêdetirî heftiyekê ye xwenîşandan, meş û çalakiyên şermezarkirinê dimeşin. Heta niha 32 kes di bûyer û xwenîşandanên vê dawiyê ên Îranê li dijî rejîma Komara Îslamî a Îranê hatine kuştin, sedan kes birîndar ketine û hezaran kes jî hatine girtin û binçavkirin.

Xamineyî, rêberê olî ê rejîma Îslamî a Îranê, di nimêja roja îna çûyî de, encama hilbijartinan erê kir û gefên tund ji xelkê nerazî xwar. Xêncî Tehranê, alozî û pevçûn di çendîn bajarên din ên Îranê di navbera xelkê û xwenîşanderên nerazî berdewam û li çend bajaran rewşa awarte hatiye îlankirin.

Wezareta Jîngeha Herêma Kurdistanê:
"Bombebaranên Turkiye Û Îranê Ziyanên Mezin Yê Gihandine Jîngeha Herêma Kurdistanê"

Malpera "dengubas.net"ê diyar kir, Wezareta Jîngeha Herêma Kurdistanê, Neteweyên Yekbûyî agahdar kiriye ku bi sedema bombebaranên berdewam ên Turkiye û Îranê bo ser axa Herêma Kurdistanê, ziyan û xisarên mezin yê gihîştiye jîngeha Kurdistanê.

Dara Mihemed Emîn, Wezîrê Jîngeha Herêma Kurdistanê, di konferanseke çapemeniyê de ragihand ku NY ji vê pirsgirêkê hatiye haydarkirin ku topbaran û êrîşên Îran û Turkiyê jîngeha Herêma Kurdistanê têk daye. Wî got: "Gellek zevî û daristanên Kurdistanê bi vê sedemê wêran bûne û erd û zeviyên zaf hatine şewitadin û jiyan li Herêmên ser sînoran dijwar bûye û war, zozan, seyrangeh û ... ên Herêma Kurdistanê hatine têkûpêkdan.

Karkirina Zarokan Neadilane Ye

Karkirina zarokan di hemû civakan de neadilane û dijî mirovî hatiye zanîn û tê hesibandin û li gor qanûnê qedexe ye, lê ev rastiya tal di gellek welatên cîhanê de tê dîtin. Li gor serhejmariya Saziya Navneteweyî a Kar, ser bi RNY, di asta cîhanê de, nêzîk 200 milyon keç û xortên navbera 5 heta 14 saliyê mijûlê karkirinê ne. Saziya Navneteweyî ya Kar û UNICEF'ê ji ber rewşa karkirina keçên kêmtemen hişyarî dan raya giştî.

Bi milyonan keç û xortên zarok di welatên Asya, Afrîqa û Amerîkaya Latîn, batî çûn bo dibistanê, pêşdebirina şiyan û karîna xwe û mifahstandin ji piştgiriya malbatê mijûlê karê bêrehmane di rewşên dijwar de ne.

Li Îranê Alavên Ragihandin Û Pêwendiyan Hatine Qedexekirin

Piştî ragihandina encama hilbijartinên Serok Komariyê li Îranê ên 12'ê Hezîrana 2009'an û serhildan û nerazîbûnên berfireh ên xelkê li dijî sextekariya berfireh a rejîma Îslamî a Îranê di wê şanogeriyê de, alavên ragihandin û pêwendiyan bi tevahî hatine qut û astengkirin.

Zêdetirî 15 rojan dibe ku sîstema şandina peyaman bi rêya telefona destî(SMS) hatiye qutkirin, her wiha înternet bi berfirehî hatiye qedexe û qutkirin û malper û televîzyon û çavkaniyên din û nûçeyan hatine fîlter û astengkirin û xelk nikare wan bi kar bîne.

Ev sansor û astengkirina berfireh a alavên ragihandin û pêwendiyan ji aliyê desthilatdarên Komara Îslamî a Îranê ve, ji ber vê yekê ye ku xelk nekare bi hêsanî dengûbasên meşên seranserê Îranê bizanibe û haydarê rewşê xwenîşandanan bibe û herwiah bi SMS û înernetê bi hevdu re têkiliyê çê bikin.

Ev sî sal e azadiya ragihandin û çapemeniyê di çarçoveya rejîma Komara Îslamî de bi xurtî û berfirehî tê binpêkirin.